# SERÊ AZADÎ



## The Struggle for Freedom

### KURDISH POEMS

By :

Qedrîcan - Rûges - Çîroknivîs



# PÊŞGOTIN

## XWENDEWARÊN HÊJA

Di vê kitêbokê de emê çend şi'irên kurdî û çend wêneyên şerevanên şûreşa Kurdistana Iraqê pêşkeşî we bikin. Didu ji van şi'iran, rast bi rast, behsa Mela Mistefa Berzanî dikin. Yek ji wan, bi qelema Mamoste Qedrîcan, di sala 1947 an de hatiye danîn û di nav Kurdan de bi nav û deng bûye. Ev şi'ira ha, cengawerî û qehremanî ku Mela, heya hingê pê rabûbû dixe ber çavan.

Şi'ira didiwa, di sala 1958 an de, piştî ku Seyda ji Sovyetistan vegeriya Iraqê, ji aliyê Rûgeş, xortekî ji Kurdên Sûriyê, hatiye saz kirin. Tê de, nivîsevar, li ser vegera Melê, kêfxweşiya Kurd û Kurdistan bi hev re, bi hunermendî û bi zîrekî, dixe pêşiya milet.

Heçî ya sisiya, ew jî ji aliyê kurdekî sûri nûsrawe. Lê, şûna ku, bi tenê, li ser Melê baxêve, wî dixe nav dîroka xebata Kurdan a van salên dawîn ji bo azadî, serblindî û pêşketin. Berî her tiştî, em tê de, li ser dirêjahiya tarîxa wî, li ber dijminên rengareng, qehremanî, mêranî û xwe li ber ragirtina Miletê Kurd dibînin. Heçî têkoşîna Kurdên Iraqê ji zemanê Nûrî Seîd vir de, ev şi'ira ha xebata hemî Gelê Kurd li Iraqê, bi awakî ronak derpêşî xwendewaran dike.

Di vê têkoşînê de, dewra eşîra Berzaniyan bi xwe, bi awakî xas tête eşkere kirin.

Bê saziyeke siyasî, sê sala şerê dewletekê nedihate kirin; ji lewre, di şerê Qasim û Basiyan de dewra Partî ya hêja jî nehatiye ji bîr kirin.

Heçî Mela Mistefa Berzanî bi xwe, di vê şi'irê de jî, bi laş û gewde bûna camêrî, fedakarî, cengawerî, dijwarî hilgirtin û xurtiya vîna Miletê Kurd bi xwe ye. Iro, di vê saetê de, Melê, ji her gav bêtir, Kurdên Iraqê civandine dora xwe û qiweteke welê pêk aniye ku dijminên me êdî wê newêrin zû bi zû, serê xwe lê bidin...

Em hêvîdar in ku îcar, Kurdên Iraqê, li bin serektiya Seyda, piştî çil sal têkoşîn, şer, perîşanî û kambaxî, wê bigehin armanca xwe û di riya azadiyê de bibine rêber û parêzgerên Kurdên din. Lê, evana bi xwe, hez nakin ku ji têkoşîna Kurdistana Iraqê bêxeber û dûr bimînin. Wek Cezayirî dikirin, ew jî dixwazin ku, li gora karîna xwe, arîkariya Şûreşa Iraqê bikin. Heya niha, Serektiya Şûreşê pir guh neda vê pirsê. Em bendewar in ku ji îro bi şûnda ewê li vê meselê hûr be û xweş bala xwe bidiyê.

Bi hêviya ku ev kitêboka ha wê bi kêrî Têkoşîna Miletê Kurd bê, em wê pêşkeşî Şûreşa Kurdistana Iraqê dikin.

**KURDÊN DERVEYÊ WELÊT**

# Berzanî

## Serdarê Kurdistanê yê Bilind

Berzanî ! Berzanî !
Di cenga welat de,
Di meydana xebat de;
Pehlewan...
Qehreman...
Tuyî;
    bûyî,
        hîmê Kurdistan...
Te,
    hîmê Kurdistan,
Çêtir,
    bêtir,
li cî danî,
Berzanî ! Berzanî !

Berzanî ! Berzanî !
Kî,
    vî,
        navî,
            nizanî ?
Her Kesî bîhîst...
U her Kesî dît...
Di roj-helat,
Roj-helata navîn,
Zivistan û havîn,
Kî dike ceng ?
    Kî dike xebat ?
Li hember çend dewletan :
Ew dujminê miletan :
Çend dewletên Istî' mar

Kî bûye Kelem ?
Kî bûye bar ?
Xeyrî vî qehremanî,
Berzanî ! Berzanî !

Ji mehan,
Ji salan,
Eskerên Nûrî-Seh-it,
Ku digel Corcan xelît,
Dixebitin,
Di perpitin;
Nikarin,
Vî şêrî
Vî mêrî
Têxin davî
Leşkerên Turk û Iran,
Balafirên Tiroman,
Hîç tu havil ne kirin;
Tiştek hasil ne kirin...
Dîsa li ser çiyan,
Dîsa li nav meydan;
Deng dike...
Ceng dike :
Berzanî ! Berzanî !

Ordû, ordû şkandin
Hezar çenber qetandin
Mîna birûsk û ewran,
Li her cî, li her deran,
Diçirise... dide deng;
Mîna dawet diçe ceng...
Sînoran diçir r rîne
Ordiyan did r r rîne...
Gava jê re bû meraq,
Bê perwa dajo Iraq...

Dide ser dilê Turkan,
Diçe bakurê Kurdan...
Dibe tîr, dibe Kevan;
Xwe dirêj dike Iran...
Ew faşîstên afiyonkêş
Dilê wan bi tirs û êş;
Bi qalûna xwe digrin,
Dikevin taya mirin.
û dibêjin :
« Dîsa Kire xuyanî !
Hate ruhstîn : Berzanî ! »

Ey biraderê Ecem !
Ixwan : Ereb-el-eşem !
Ey demoqrat Turk qardaş !
Birader... Ixwan... yoldaş...
Em, heval û cîranin;
Dujmin : Amerîkanin...
Ingilîz in, In.. gi.. lîz,
Zinhar, jê re, mebin lîz !
Serdarê me : Berzanî..
Gerek herkes bizanî;
Serdarê azadiye...
Nawadarê abadiye...
Rabin, hûn jî bilivin !
Li dora wî bicivin !
Bêjin :
«Bijî !
Berzanî...
Xelaskarê însanî...»

15-6-47

Q. C.



Seyda, di nav kurekî xwe û hin Berazaniyan de

# Hatina Berzanî

Kaniyên Kurdistan !
Bi comerdî,
Bi dilşadî,
Avên sar û zelal derxînin...
Nift û benzînê bêtir birijînin...
Çiyayên Kurdistan !
Temenê bigirin,
Peywanê bikin,
Ji bo Berzanî serê xwe bitewînin...
Kewên Kurdistan !
Bikin qebqeb, lal bibin,
Serê xwe hilînin...
Co û cobar !
Bixuşin,
Bilîlînin...
Serşax û pelik !
Hilperin,
Bireqisin,
Bibin baweşîn,
Çar alî,
Pir hêdî,
Xwe bihejînin...
Dar û ber !
Şivên ter !
Xwe ji kulîlkan rapêçin,
Bixemilînin...
Sorgul û çîçek !
Pelên xwe, biweşînin,
Bikin xalîçe,
Çar goşên welêt raxînin,
Bireşînin,
Bêhnê bifûrînin...
Heyva li çarde !
Berê xwe bide me,
Nêzîk e sibe...

Keç û xortên kurd !
Govendan,
Dawetan,
Li darxînin,
Bistrên,
Bilîlînin...
Kevokên spî, bifirînin !...
Iro xakê ciwan,
Bû xemla cîhan !...
Pîr û kal !
Dest bi gopal,
Werin seyranê,
Zû, bilezînin !...
Biçûk !
Lek bi lek,
Werin,
Laşên xwe yên bê kiras,
Piyên xwe yên xwas,
Veşêrin,
Binixumînin;
Bira çav û lêvên we bikenin,
Bixwînin,
Bibin serîpe, li ser baskên rê
Wextê Seyda bê...
Karker û cotkar !
Pêla birîndar,
Ev e roja we !
Ev e dema we !
Dakevin nav taran !
Nav lat û zinaran.
Zendan rahejînin !
Qeydan bişkînin !...

Ararat û Aras !
Hevdû ramîsin wek çakûç û das.
Çemê Reş,
Zab hilat,
Dicle û Ferat !
Biherikin,
Bibezin,
Mizgînê bidin,
Bêjin :
«Dengê felat,
Şêrê welat,
Hewara me,
BERZANI hat !!!"
Dema hat gotin :
«Berzanî hat»
Tirseke mezin
Ket dilê dizan,
Dilê xwînmijan :
Dijminên Kurdan
Li hev digerin,
Li hav dinerin,
Ji hev dipirsin :
«Berzanî !
Dîsa zivirî ? Kê ew anî ?!...»
Qîrên Berzanî
Wek dîkê sibê,
Wek defa mizgînê,
Wek dengê jînê,
Kurd şiyar kirin.
Şeva tarî çû,
Gelawêj bilind bû,
Şiveq hilat,
Tîrêjên jînê xwe berdan welat;
Dora me jî hat,
Li pêş me vebû dergehê felat,

Riya xebat...
Em tev bûne kar,
Wek destê cotkar,
Wek dilê şiyar...
Pêşmêrên me ne,
Dilxwazên me ne
Xêrxwazên cîhan,
Kesên birûmet ji bona insan,
Rêzanên Sovyat,
Xortên Rojhilat
Pir Kêfa wan hat
Dema Berzanî vegerya welat...

1958 Rûgeş



Mela di nav Berzaniyên xwe de

# Şerê Azadî

Inglistana xwînmêj,
Nûrî Seîdê noker,
Qasimê şêt û gêj
U Basiyên cinawer
Bi top û tang û balafir,
Bi bombeyên bi agir,
Bi Heres û bi Firsan
Kambax û wêran kirin
Welatê me Kurdistan.

«Qewmiye û ol û dîn ,
Navê Siltan Selahedîn,
Şiûbiyet û Infisal,
Bi Israêl re heval»
Sûçên têvel û rengîn
Tevde kirin seferber
Xwe xistin nav ceng û şer.
Bi hezaran gund û şar
Li ser kal û zêç û zar
Bi timamî anîn xwar.
Hêsinayî, zad û dar,
Rez û pez û berx û kahr
Şewitandin, kirin ar.
Kerkûk û Çemê Rêzan,
Amediye û Berzan
Kavil kirin, perîsan.
Sed hezar jin û mindal
Bê xanî û milk û mal
Bi mehan û roj û sal
Tazî, birçî û bêhal
Man li çiyan, çol û pal.

Dil dikirin ji zû da,

Bi navê Misilmantî,
Bikin Ereb me Kurda
U bi zor û bi xurtî,
Wek koleyên kevnare
Me bihêlin ji xwe re
Bi erd û milk û laş û can
Ji xwe re bikine qurban.
An jî,
Bi her awayî :
Bi kuştin
U xwînrêjî,
Bi sotin
U bi bomban,
Bi singî û bi gulan
Bînin qira me Kurdan.

Wî Iskenderê Yewnan,
Impratorên Roman,
Holako û Cengîzxan,
Siltanên Benî Osman,
Serfermandarên Tûran
Ev tişt dabûn ber çavan :
Pelixandina Kurdan
Bindest kirina Kurdistan
Ji xwe re kiribûn raman.
Lê pûç bû her gav ev goman
U pelixî serê wan;
Vî miletê dilawer
Zora wan bir her û her,
Erdê xwe yê gulistan
Ji wan re kir goristan.
Ew riziyan û bûn ax
Em bi xwe man lat û şax...

Xwînxwarên axir zeman

Sêwelekên Truman,
Seîd, Qasim û Basî
Tev li zaninê asî,
Guh nedan
Tarîx, dîrok û destan,
Guhartinên van salan,
Şiyarî û yekîtî,
Jêhatî
Bûna Kurdan.
Nûri Seîdê pîlanger
Bi mîsaq û bi peyman,
Bi kirîna nokeran,
Bi nermî, gah bi şûtan,
Dilxwes kirin îngîlîz,
Nefta me ya wek dengîz
Ji me bire bi qamçî
Dan van kesên bê sinçî,
Em bi xwe hiştin bindest,
Reben
Pêxwas
U birçî.

Lê ne Berzenc
Ne Berzan,
Ne dilpakên Ereban
Xwe pîs ne kir,
Mat neman :
Bi das, çakûç û xencer,
Bi tifing an bi diran,
Ji xebat û ji meydan,
Ji ber topên xwînxwaran
Tu caran xwe nedan der
Heya xistin bin lingan
Laş û goşt û xwîn û ser
En kûviyên cinawer...

Bi navê gel û milet,
Demokrasî û huriyet
Qasim kir ev qehremanî;
Bi zîrekî û mêranî
Ewî dawiya wan anî.
Piştre rabû ser xwe
Bratiya Kurd û Ereb
Ji dil da ber çavên xwe :
Di Destûra demdar de
Kurd û Ereb
Bûn şîrîk di Iraqa azad de.
Partî û ehzabên Kurd
Li hemî bajar û gund
Bi serbestî libitîn
U bo xweşiyan Iraqê,
Bo aşîtî
U bratî
Bi dil û can xebitîn.
Qasim hingê demokrat,
Dostê dilxwazên welat
Qerarên kevn hilanî
Rêkir Sovyetistan
Berzanî ji wê anî.
Li dora her du peyan
Xort û kal tev civiyan
Ku nehêlin tu ziyan
Bête erdê niştiman...

Lê Istimar û pîlanger
Tev li hundir û li der,
Qet ranezan
Man şiyar
Tim li xebat û li kar :
Bi pêlweş û bi pere,
Bi kuştin û bi sewre

Li hev berdana dost û yar,
Hilweşandina Komar
Kirin xayeke eşkere.
Ingîlîz û Emerîkan,
Merakiş û Benî Aswan,
Faşîstên Mîşel Eflaq
Tev bûn neyarên Iraq.
Digel tehdîd û tirsdan
Qasim danîn ber gulan.
Bi arîkariya Serac
Şewaf kire isyan.
Bi fitne û istifsaz
Kuştina Kurd û Tirkman
Li Kerkûkê kirin saz...

Van bûyerên rengareng
Qasim kirin gêj û deng :
Laş û mijî lerizî,
Eniya ceyş û milet
Hêdî, hêdî derizî.
Hikmê Zaîmê Ewhed
Bû bêpayan û bê hed.
Dost û partiyên pêşverû
Ji çav ketin
Bûn edû.
Peyayên seyid Nûrî,
Gel bêbext û serserî
Jê re bûn yar û perî.
Ehzab û partiyên gel
Du par kirin,
Berdan hev.
Heçî daxwazên Kurdan
Qasim pişta xwe da wan :
Destûr û gotinên xweş
Li ber çavên wî bûn reş;

Partî Kurdî Demokrat,
«Pêşkewtin» digel «Xebat»
Li wan hate Xezebê,
Gelek girtin, êşandin,
Dan ber darên ezabê.
Li Bakurê Kurdistan
Sileh dan Zîbariyan,
Sofî, Mirîd, Şêx Lolan
U ew şandin ser Berzan.
Du, sê cara li pê hev
Li hev xistin roj û şev...

Lê, ji bo welêt û xatir
Melê xwe zû aciz nekir;
Bi şîret û bi şewrê
Libitî
U xebitî
Ku Zaîm bîne ser rê.
Lê, bi xweşî û bi gotin
Dilê vî nehat sotin;
Ewî rabû bi şêtî
Ji bîr kir ehd û bratî :
Balafirên bê hejmar,
Ji Dûkan
Heya Berzan
Bakur kirin taromar...

Hingê hêrs hate Seyda :
Der hal derket ji Bexda,
Xwe gihand mêrên çiyê,
Pêşmergên azadiyê,
Berzaniyên cengawer
En bê tirs û bi ceger,
Bi zanîn hem bi huner
Li ber wî tev helistan

Bo heq û bo azadî,
Bo xweşiya Kurdistan,
Dev bi ken û bi şadî,
Wek lehî û wek birkan
Ji nişka ve herikîn;
Zîbarî û Sêx Lolan,
Şerefan û Birufkan
Li ber wan zor lebikîn,
Tev li hev bûn şerpeze,
Gî bi ricf û bi lerze
Reviyan çar aliyan.
Hin ji wan bê mijiyan
Çûn ba Tirkên kepeze.

Digel Berzaniyan
Berwarî, Gulî û Sindî,
Kurdperwerên Amêdî
Wek bombeyên atomî
Çûn ser mexfer û şirte
Top û tangên qasimî :
Esker, zabit û fermandar
Tev «Caşpolîs» ên xwînxwar
Çek û sileh avêtin,
Li ber êrîşên bruskî
Ji desthêlanînê ketin...

Li ser van serdestiyan
Kurdên Iraq bi dilkî
Bi xurtiya xwe hesiyan :
Li Erbîl, Kerkûk, Sileymanî,
Ebas Mamend û Kawanî,
Celal û Huseyn Boskî
Ermen, Aşûr û Kildan,
Bi hezaran qehreman
Mal û mindal tev berdan

U daketin nava meydan;
Bi arîkariya milet,
Bi Partîke bi rûmet
Ceyş û «Caşên» hokumet
Ji hev xistin,
Pelaxtin;
Tevî top û tangên wan
Serê wan xweş qelaştin.

Hingê Qasim xeyidî,
Bi balafir û gulan
Bê xanî û nan û mal
Bêçare hiştin gundî...
Lê, ne kuştin,
Ne talan,
Ne li şikefta razan,
Ne birçîbûn û tazîtî
Nexistin tu serdestî
Destên wî yên lewitî.
Ji bo veşartina halê welat
Ewî dikir pir xebat;
Bi qîrîn û bi barbar
Digot : «Werin hun îcar
Bi çavên xwe bibînin :
Quta'a tûriq, îstîmar
Bi Kurdan re bûne yar !
Bi xwe me ew qelandin,
Berzanî bû brîndar
U bi çend kesên perîşan
Xwe da sînorên Iran !...»

Gava ev peyv û derew
Tarî dibûn weke şew
Qasim dikir mêranî
Efweke nû dertanî :

Şer dihate rawestan
U dixwestin ji Kurdistan
Ku çek û ẍileh tev deyne
Wek kiras û wek fistan
U vegere, here mal,
Ji xwe re rahet rûne
Nav zar û zêç û eyal...
Ev hal demekê dimeşî
U xelk digihane xweşî.
Lê, gava Kurd sar diman
Ber van gotin û peyman,
Qasim dîsa dibû dîn
U, tije enir, tije kîn,
Bi emir û bi ferman,
Ji piçûk û keç û bûk
En goşt nerm
U laş narîn
Bê fehît û bê şerm.
Tanî bi hezaran ax,
Nalîn,
Zarîn
U kalîn !!!

Lê, bi van amal û kar
Qasim ma bê arîkar,
Bê hevalbend û ẍemxwar.
Tevî ku hîç hel nekir
Heval û dostên hundir
Ji xwe re kirin neyar :
Dijminên wî yên kîndar
Ji vî halî xeberdar;
Dil û ceger peritî
Xwe pêk tanîn bi xurtî
Ku kêsa xwe lê bînin
Wek kûviyên dirende



Ebas Mamend, aerekê Eşîra Ako, yek ji mezinên Sewrê

Heyfa xwe jê hêlînin...

Ev kês kete destê wan
Roja Çarde Remezan :
Bi çend top û balafir
Ewan hicûmî wî kir.
Ew, Qasimê qehreman,
Li Çarde Temûz pehlewan,
Ew gurê bê tirs û har
Lê, li Bakur brîndar,
Mayî sersem, gêj û jar
Li ber Basiyên xedar
Li meydanê ma «wehîd»
U ji ber dînîtiya xwe
Mir û çû «poxlî şehîd».
Gelek camêrên egîd,
Wek Macid û Mehdawî
Tevde bûn qûrbana wî;
Tifing di dest de mirin,

Ser kirin heya dawî...
Hikim birin li Iraq
«Sibyan« Mîşel Eflaq.
Bi navê «Iştrakiye»,
«El-Wehde» w' «El-Huriye»,
Ser tijî mij û dûman,
Deh hezar xort û ciwan
Dan her top û debaban.
Xwîn herikî li kolan
Wek lehîkê ji baran.
Li Bexda, Kût û Imare,
Ciyên nû û kevnare
Dibistan û bêmaristan
Tevde bûn heps û zindan.
Ezab, cefa û lêdan

Ku dikirin li insan
Nebûye li tu deran
Ne li German û ne li Yaban :
Keçên wek gul parastî
Rûsar kirin bi zordestî;
Bi das, birek û çakûç
Çavên xelkê deranîn,
Dest û lingê wan birîn.
Dar dixistin jêrê wan,
Rûnê qelandî devê wan,
Utiyên xweş Kizirî
Gerandin ser lasê wan.
Pişt û parsû sax neman,
Didan, neynûk hilkirî;
Jîna van kesên bê sûç
Kirin, bi vi awayî,
Tişteki bi jehr û pûç...

Heçî ji bona Kurdan :
Dehê Sibatê, ango Şanzle Remazan
Basî eskere kirin, bi îlan û bi beyan
Ku îcar ewê binasin
«Hiqûq Qewmiyên» Kurdan :
Rê û dergeh tev vekin,
Azad kin pênc hezar girtî,
Bihêlin zû here jor
Çay, caw, şekir û pirtî.
Wefdek bê, pê re rûnin
Bi xweşî û serbestî,
Pêk ve bidin û bistînin
Bo vegera aşîtî.
Piştre bixebitin
Ku bê dayîn bi rastî
Di nav Kurd û Ereban

Bingeha dostaniyê
Bawerî û bratî...

Piştî salek û nîv ser
Bi tifing û bi xencer
Zidî tang û balafir
Kurd westiyabûn, axir.
Tu arîkari nedihat
Ne ji Rojava, ne Rojhelat;
Hin rojnameyên derve
Car, car bi şewq
Dinûsîn
Ku li Bakurê Iraq,
Miletek bi navê Kurd
Ji bav û kalan de gurd,
Bi ceberûtekî wek Nemrûd
Dike şereki hîç nedî...
Gotin û nivîsarên wanî
Dixist ber çavên cîhan
Mêranî,
Dijwariya têkoşîn,
Xurtiya vîn
U canbêzariya Kurdan.
Ji ber van rojnameyan
Peyda dibûn ji bo wan
Hin dilsoz
U Hin dilxwaz
Di nav Rûs û Emerîkan
Swîs, Çek û Italiyan.
Lê, heçi di dilê wan de
Bê deng dima, nedihat der
U di destên Kurdan de
Diyar nedibû tu eser
Ji topên balafirşikên,

Radar, pêlwes û dermên.
Li ber van rastiyên dijiwar
U soz û wadên pir tamdar
Şer rawestandin
U li hev hatin
Bi xwesî
Ji milet re her dibû
Demeke bêhn standin,
Xurtî, şadî û geşî...

Ji lewre, baş dîn şûreşger
Ku bînin dawiya ceng û ser
U bişînin Bexdayê
Wefdeke jîr, bi ceger...
Ew wefd pêk hat û gihayê
Bi hêvî û mêranî
Dilrastî hem giranî
Li bin serektiya Telebanî.
Peyayên hingê li ser kar,
Xudî hikim û xudî dar
Insanên kêsdî û bê ar,
Arif û Sadî bi yek ve
Xwe nîşan dan ji derve
Bi geşî û rûyekî şeng
Hemdeng
U hevriyên Wefda Kurdî.
Pê re rûdinistin
Bi şadî
Dipeyivîn û daxaftin;
Ew bi xwe re dibirin
Ta Cezayir û Misir
Ba Benbella û Nasir.
Dibiştin ku Telebanî
Li her der rûne bi hêsanî
Derpêş bike ber cîhan

Bi eşkere û mêranî
Doz û daxwazên Ķurdan...

Lê, ji roja pêşîn de
Dilreşiya Basiyan
Xweş dikete ber çavan :
Wefda Kurdi ya jêhatî
Dixwest «Hikmekî Zatî»;
Heçî hokumet û Basî
Daxaftin, bê heqnasî,
Bi ńazî
U tinazî
Ji «Idareke Lamerkezî».
Peyv û civîn pir dibûn,
Diçûn
Ba hav
U dihatin,
Rûdinştin
Roj û şev,
Xweş dikirin bi lêv û dev
Lê, nedikarîn
Li hev bên
Li ser hin pirsên
Bingehîn.
Berpirsiyarên Iraq
Sond dixwarin bi telaq
Ku ewê bi cî bînin
Heq û daxwazên Ekrad.
Lê. roj û meh derbaz dibûn
Bêî ku bigehe tu murad
Miletê Kurdê zebûn.

Heta giha rojekê
Wa kir Çerxa FeleKê
Ku guh nede hokumet



Yek ji qehremanên Miletê Kurd        Şehîd Mehmûd Kawanî

Azadîxwazên milet :
Ji ber civîna Qahirê
Ku «Wehdê» bîne ser rê
Serek û mesûlên welêt,
Bi awakî zor kirêt
Pişta xwe didan Kurdan
U êdî her ker diman
Ber doz û daxwazên wan.
Ji ber vê bêdengiyê
Kurd gihan bêhn tengiyê
U roja Bîst û Heftê Nîsan
Bîranîneke pir giran
Dan destê hokumetê
U jê xwestin bi xurtî
Ku guh bide daxwazên wan
Yan na, ewê hilgire
Her texlît mesûliyet,
Berpirsiyarî û nedamet.

Tevî van tehdîd û tirsdan
Hokumeta Basiyan
Dilê xwe qet venekir
U deriyê peyvê jî hîn yekcar kilît nekir
Ji ber vê durûtiyê
Sarî û bêbextiyê
Heyirîn Kurdên keleş
U bi awakî nexuyanî
Rêkirin ba «Dêwê Reş»
Celalê Telebanî.
Ebdinnasir
Bîr dibir
Ku bê xweş kirina dilê Kurda
Aşîtî û pêşkewtin cênabin di Iraq da
Lê, li ser pirsa «Hikim Zatî »

Serek Cemal,
Bi rastî
Dima bê deng û lal
Ji tirsa ku wî sûç kin
Bi Kurdîtiyê re heval
U terefdarê «Infisal».

Gava li Bexda
Wefda Kurda
Lingê xwe li erdê dida
Ku li hev bên bi kûbarî,
Bi nermî û hevkarî,
Basiyên me yên lîzbaz,
Hem rovî û hem şerxwaz,
Bi huner
U fen
U ken
Xwe pêk tanîn bi dizî
Bo şer, kuştin û xwînrêzî.
Piştî ku Sûriye, Iraq û Misir
Bo «Wehdê» li hev nekir
Basiyên Şam û Bexdad
Yekitiya xwe danand
Bo qelandina Ekrad...

Piştî dîtina Nasir
Vegeriya bû Bêrûtê
Telebanî ji Misir;
Bi rojname û komcivîn
Wî bi cîhan da zanîn
Rewşa Kurdan a dawîn.
Şûngirê wî li Bexdad
Salih Yûsifê canpolad,
Ji halê Iraq xeberdar
Ew zû kire agehdar

Ji lîzên Basiyên xedar.
Sand û gotê bi kurtî :
«Wê li me bibe ceng û şer,
Bo te nabe tu veger;
Bazde, here Ewropa,
Tevî tifing û topa
Bo me, li wê peyda ke dost û heval
«Yar û mal...!»
Gava Yûsifî dikir ev gotin
Basî despê kiribûn
Bi êsandin û bi girtin
Li Sûriye û li Iraq
Her du dewletên Eflaq.
Hin ji Kurdên Sûriye
Kiribûn mehrûm û bê par
Ji hiqûqên medeniye
U digeriyan wek dîn û har
Ku wan deynin bin çog û dar

Lê, Dehê Hezîran
Basî bîst û çar saet dan Kurdan
Ku bi las û çek û sileh
Xwe bavêjin bextê wan
Yan na ewê li wan bibare
Gule, sarox û bomban
Wek baranê ji ezman :
Tişta bînin serê wan
Nedîbin li tu zeman,
Ne li wextê «Kak» Qasim,
Ne Cengîzxan,
Ne Tûran :
Ser û binê hev kin Kurdistan
Şûna gul û baxistan
Wê bêxin nav pêt û ar,
Tije agir û tije nar
Mîna dojeha kevnar.



Hen ji çek û cebilxane ku ketin destê şureşgera

Bi rastî,
Hestê Hezîran
Bi awakî faşîstî
Bi top û tangên pir giran,
Bi «Heres» û bi «Fursan»
Despê kiribû Sa'adî,
Bi hovî û nemerdî,
Bi qelandina Kurda
Li Kerkûk û li gunda :
Bi tanga çûbûn ser mala,
Ser jin, kal û mindala;
Ew kiribûn toz û ax
Li bin dar, pûş û pelax.
Ji bo benzîn û neftê
Sorce û gundên destê,
Bi tang û top û bûldozer
Kirin erdekî rût, bê beşer.
Hezaran man bin zincîr, dolav û teker,
Çil hezar jî, bê milk û mal,
Dil bi kul,
Laş bi birîn,
Çav bi girîn,
Qirik givaştî,
Dil qelaştî
Avêtin çiyê, teht û kendal,
Ciyên nependî,
Ne nas
Qet nedî...
Piştî ku Kurd dan çiyan
Hokumeta Basiyan
Ereb anîn şûna wan,
Ser gund, milk û malên wan.

Yanzde Hezîran
Bîst û çar saet qedi yan :

Pênc firqeyên îraqî,
Ceyşekî xurt û raqî,
Tevî tang, top û balafir
Bi wehşiyeteke safir,
Bi sî-çil hezar kafir
Ango Heres û Fursan,
Ew mexlûqên bê wicdan,
Ji Xaneqîn ta Şêxan
Kurdistan dan ber bomban;
Agir lê xweş barandin
Hem ji erd, hem ji ezman.
Sa'adî, Amaş û Tekrîtî,
Dijminên Kurd û Kurdîtî,
Welê danîbûn ber çavan
Ku piştî pênc an şeş rojan
Pişta Kurdan bişkînin
U wan bînin ser çogan.
Amaş negotibû ma :
«Mako eyye harb fî Kurdistan,
Eskerê me çûye jor bo «Nizhe» û bo «Seyran»...
Seyrana hilweşandinê,
Xwîn rijandin û kuştinê!...

Roj û meh derbaz dibûn,
Gund û şar winda dibûn,
Yêtîm û sêwî jar dibûn
Lê, Pêşmerge û şervan,
Pêşder, Ako û Berzan
Bindest û teslîm nedibûn.
Bi huner û mêranî,
Bi şerê partîzanî,
Ji hev û du dixistin
Ceyş û Heres û Fursan,



Celal Telebani bi hin rojnamevana re li Raniyê

Ew dihiştin perîşan
Dil bi tirs û êş û jan...
Ji ber şikestina xwe
Amaş gelek lezda xwe
U rêkire Sûriye bo gazî û bo hewar
Fehid-il-Şaêr û Yermûk jê re hatin
arîkar...

Li ber cengaweriya Kurdan
Hîn bêtir dima cîhan
Mest û heyran :
Bi pêlweş û rojname
Xelk bala xwe dida me;
Hineka, bi awakî hin çêtir,
Bi rastî arikariya me dikir
Derman diçû ji Xaça' Sor,
Hokumeta Welatê Jor,
Ango Sovyetistan,
Ji bo pirsa Kurdistan
Tehzîr dida Tirkiye,
Iran, Iraq û Sûriye.
Ji Meclis-el-Emin dixwest
Ku Pirsa Kurda qeyd bike
Wek tiştekî li ber dest.
Li ber Encimena Pirsên Civakî
Ewê du cara anî meydan
Kuştina Kurdan a komekî.
Lê, ji ber dijimintiya Endaman
Jê re nedî tu çare û tu derman.
Mongiliya kire hewar
U bo me hate arîkar:
Gote Neteweyên Yekbûyî :
«Kuştina Kurdan li Iraq
Dibe cirmeke mitlaq.
Ez ji we îro dixwazim

Ku ji bo Eylûla qadim
Hun vê pirsê binûsin
Ku Basiyên derbeder
Li Iraq û li her der
Heq û qanûn binasin...!
Kurdên derveyê Welat
Ew jî dixebitîn bo felat :
Li Bêrût, Parîs û Mûnîx
Li Prag, Moskû û Zûrîx
Bi gotin, qelem û civîn,
Bi ihticac û bend nûsîn
Wan eşkere dikir rastî
Ji bo Kurd û heqperestî...

Van kirde û van gotin
Ku ji her der dihatin
Dilê Kurdan dikir xurtir,
Serê wan hîn blintir.
Heçî ji aliyê Basiyan,
Welê dibû halê wan
Ku li welatên Ereban
U li her derên cîhan
Rûreş dibûn, şermisar
Ji bêbextî, fehît û ar...

Lê, bi vana, bi tenê,
Ne dibû tu car serdest
Ne Pêşmerge, ne Eşîr
Ne hîç kesê kurdperest.
Ma Telebanî negotibû li Parîs û li her der



Hin ji hevalên Şehîd Mahmûd Kawanî

Ku heq tête standin bi tenê di meydana ser.
Ji lewre Şûreşger
Dixebitîn her û her
Ku pêşde bibin
Fen û hunerên şer :
Zanîngeh vebin
Bo xortên çeleng
Ku hînî wan kin riyên herb û ceng,
Tevî siyaset, zanînên pir reng...
Heçî ji aliyê sileh û çek
Wan, bi rastî, zor dida xwe gelek
Ku bi destê xwe xin hin çekine giran
Zidî balafir, tang û debaban.
Lê, piştî pir xebat, havildan û ger
Wan peyda kir tenê panzle bazûkayên zer.
Lê, li nav çiyê, newal û kendal
Di destê Pêşmerge, eşîr û heval
Vî çekê sivik, wek boriyên sobe
Nedihişt derbaz be ne tang, ne debabe;
Bi ateş û agirê guleyên van Bazûka
Dişewitîn ev silehên fêris wek kaziz û ka.
Bi vî awayî, tu tang ne diwêrî bi şev here der
Ne jî ji deştê derkeve û li nav çiyê bike şer...

Li ber serdestiyên Kurdan
Di le xistinên pir giran
Wek Dûhok, Akra û Zaxo,
Herîr, Sancak û Ako,
Derbendê Baziyan û Çiyayê Bêxêr
Ku tê de xerq bû Yermûka Fehîdê Şaêr,
Bawerî û îmana Basiyan hejiya,

Bingeha hikmê wan xilxilî û riziya.
Riya Qasim girtin bi derew û bi nîfaq;
Bi peyv û gotin Mela revendin ji Iraq
U Şûreş vemirandin li zozan û li qişlaq...

Lê, roja Yanzde Çiriya Paşîn
Ji Kûnêra wan a veşartî herikî edab û xwîn;
Hingê kete ber cîhan rastiya wan a dawîn:
Salih-el-Sadî û benda wî danîbûn şewr û civîn;
Hazim Cewad û Şibîb, bi xeyd, enir û bi kîn,
Bi çend esker û zabit
Ji nişkave dora wan girt.
Ew ji civîn derxistin
U hema roja dîtir,
Bê qiymet û bê xatir
Tev ji Bexda dûrxistin...
Benda Basiyên serdest
Xwe bawer dikir serbest
U hikim ji xwe re dixwest

Lê, Arifê bê sinçî,
Hikim perest, çavbirçî.
Digel fermandarên serleşker
En westiyayî ji ceng û şer,
Kêsa xwe li Basiyan anî
U di çend rojan de, ew ji meydan hilanî.
Heres-el-Qewmiyê bêbext
Ji desthilanînê ket.

Windawiyê balafirvan
Li Sûriye bû mêvan.
Roja Hejde Çiriya Paşîn
Arif bû hakimê Iraqa bi şîn.
Heçî Şibîb û Cewad
Bi girîn
U bi zarîn
Ji Bexdad
Çûn, firîn
U li Qahîrê danîn.

Heçî Meseleya Kurdan.
Wek Qasimê gorbegor
Berî ku bin[illegible] jêr û jor
Arif efwek danî bo wan
U, bi navê bratiya tarîx û dîn
Xwest ku çekê xwe deynin
Bê daxwaz û bê xeyd û kîn.
Lê, îcar Arif Kurd zor kenand
Ji ber ku wî xwe dixapand :
Ma bîr nedibir ku Kurd bûne xurtir,
Bi her awayî, ji berê çêtir;
Bi diline pak, fireh û germtir
Bi çek û sileh û serine tejî
Bi hiş û huner, bi eql û mejî...
Ji lewre Kurd tu guh nedanê
U ji berê bêtir ketin meydanê;
Qiwetên Arif kirin şerpeze,
Ji şer westayî, bi tirs, bi lerze.
Arif lezda xwe, sande Kurdistan,
Xweste aşîtî, ateş rawestan.
Kurd nehatin xwar ji «Hikmê Zatî»
U şertine din berî ku deynin hîmê bratî.
Mûşîr siwar bû, çûte ba Nasir



Zabitek ji Sewrê, bi xweşî, bi esîra re dipeyive


U jê hêvî kir
Ku bikeve nav wî û Kurdan
Çareyên lihevhatinê bixe destê wan.

Cemal kêsa xwe dî û şand pê Şewket
Ku li Qahîrê, ji bona Sewrê, dikire ẍeyret
U ew nard, bi dizî, heya Kurdistan, kaẍitek di dest.
Çend roj derbaz bûn
Ji Pêlweşa Beẍda
Du beyan der çûn :
Kurt û ji bin da
Xweş ne xuyanî;
Yek ji Arif bû
Yek ji Berzanî.
Ya Arif dikir behsa bratî
Hiqûq-el-Qewmî bê «Hikim-Zatî».
Heçî Berzanî, kêfxweş dixuya
Ji şer rawestan li gund û çiya.
Van her du beyan hîç razî nekir
Ne Sûriyên Basî
Ne ji Partî, Mekteba Siyasî.
Basî digotin
Ku hin sir hene
Di vê l'hevhatin
Gerek e bêne
Li pêş raxistin...
Heçî gaziya Mekteba Siyasî
Ku dev neyite berdan ji «Hikmê-Zatî»
Armanca şerê me ya esasî...

Heya niha, em nizanin, bi rastî
Çi dibe li navbera Hokumet û Partî ?

Destûra ku wê dawiyê Arif pêk anî
Kurd gî xeyidandin, tevî Berzanî.
Di hokumeta Yehya ya diwemîn de
Ji Neqşibendî pêve Mihemed jî kurd e
Neqşibendî bi xwe ji peyayên Fursan e
Heçî Mihemed, hîn ne xuya ye çi însane.
Çi ku be, divê ku yên berpirsiyar îro li Iraq
Dersa bistînin ji serpêhatiyên Qasim û Eflaq
Ku nema dikarin bêxin bin linga hiqûqên Ekrad;
Ne jî bajon li şarê Bexdad
Demeke dirêj
Hikmekî xwînrêj...!

Heçî Berzanî
Bê glî û gazin
Em jê dixwazin
Ku bi giranî,
Ji her wext bêtir
Bibe camêrtir;
Nîşana xebat,
Her gav dilşewat
Ji bona welat.
Rêberekî dilovan,
Şervanekî mihrevan.
Bike ku li Iraq û Iran,
Tirkiye, Parîs. Berlîn û Libnan
Kurdên hunermend.
Zana û lewend
Dilpak û dilxwaz
Gî li dora wî bibin rêz û saz
Ji bona welat,



Seyda ji Mişel Eflaq re ; « Here û êdi bela xwe ji Kurda veke...»

«Lisan—il—Hal»

Ji bona felat,
Ji bo gel xweşî,
Ji bo wî geşî,
Ji bona rindî
U serblindî,
Bê nemerdî
U pozblindî
Bibine cindî !...

23-6-1964 Çîroknivîs

KURDINO !

Ji bo pêsveçûn, yektî, xurtî û serblindiya xwe, hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin !

Ji bo wan kesên ku bi erebî dixwînin, emê livir tîpên erebî û tipên kurdiyên latînî bêxine ber hev. Piştre, emê ji we re, ji tîpên latînî elfabeke piçûk pêk bînin, bi hêviya ku ji bo xwendin û nivîsandinê ewê bi kêrî we be...

TIPEN KURDIYEN LATINI û TIPEN EREBI

| آ | ب | ج | چ | د | أ | اي | ف | گ | ه | إ | اي | ژ | ك | ل | م |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| a | b | c | ç | d | e | ê | f | g | h | i | î | j | k | l | m |

| ن | أو | پ | ق | ر | س | ش | ت | اُ | او | ڤ | و | غ | خ | ى | ز |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| n | o | p | q | r | s | ş | t | u | û | v | w | ẍ | x | y | z. |

**ba be bê bi bî bo bu bû baba babo bêbê**
**bîbî banî bêr bor**

**ca ce cê ci cî cocu cû caca caco cêcê**
**cicî can cot cin**

**ça çe çê çi çî ço çol çil çêr çarçî çarde**
**çare çêrandin**

**da dî dê dêl dûr dêr dide**
**dil dîl dudilî derman dupişk dûrbîn**

**fal fîl fedî firî ferman fener**
**fêkî feqîr firî firçe felemez**

**ga ge gê gî giş gund gul gol**
**gor gel gêr gopal ger**

**hewar hemî her û her handin har hal halo**
**hinar hîm heval hildan hew**

**jêr jor jîr jar jan jendin jin**
**jîn japon jîjo jinanîn**

**kêr kar ker kor kûr kurd ka kanî ki rin**
**kolan kole kûvî**

**lal lê lêv lalo lêdan livir law lorandin lorî**

mal mil mirin mirdar milk melevan mî mor
nîr na nonêr nûr narîn nêrîn
newal nalîn nexweş nîvişk
par per pêr pir por pere perçe pen
pehlewan pirtal
qîr qor qir qîrîn qop qot qerar
rê ro rû rev rêkirin rût
sar sîr sor sond siwar şîr şor şûr şer
ser şêr şerm şîrîn
talan tîr tor tav tol tûle
tesî tilî tîn tirpan teşt tenbûr
vala veger vemirandin vexwarin veşartî
wa wê were winda war
xebat xwar xencer xelk xwîn
yar yadîgar yarmetî yawer
zêr zer zor zû zaro zalim zorbe zinar
zinawer zirav zarav

## ÇEND METELOKÊN KURDI

Xebat ker e, bajo here — Xebat şêr e, dest bavêjê, dibe rovî — Şêr şêr e çi jin e, çi mêr e — Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne. Ne gundê bê rez, ne konê bê pez, ne mêrê bibêje : «ez û ez». — Bi xweziya dest nagêhê keziya.

1— Rûpela Pêşîn :

Mistefa Berzanî di kozikê de, dûrbîn di dest

2— Rûpela didiwa:

Ezîz Reşîd Eqrawî Serleşkerî Kurd.

3— Rûpela Paşîn:

Margerît Jorj, Jan Darka Kurda.

